



Sînema Kobanî

Weqfa Adar

Li ku derê şer bûye
dîsa derfetên hunerî çêbûye

Alîkariya we di avakirina Sînemaya Kobanî de

STICHTING ADAR

Sînema Kobanî



Zêdetir ji sînemayekê

Di Sînemaya Kobanî de dê çendîn salon hebin, yek ji wan jî dê vekirî be. Her wiha dê navendek mînaqêşeyê, eywaneke banî, xwaringeh û qehwexane, pirtûkxaneya filman, akademiya filman û helbet Radyoya Kobanî jî li Sînemaya Kobanî stûdyoya

Xêrhatina germ

Sînemaya Kobanî jî aliyê niştêcîhan ve bi coş tê peşwazîkirin.



Keçek li Kobaniyê ku qet neçûye sînemayê, sînemaya bajêr dixwaze û dibêje: "Ez dixwazim bi bav, dê û birayê xwe re li flmekî temaşe bikim. Bi popcorn û kok."

Rojnameger Mehmud Balî dibêje: "Sînema dê civakê bi he ve girêbide. Me berê gelek tişt ava kir, em niha dixwazin ji bo mirovan tiştan çêbikin da ku ew dîsa bibin xwedî hêvî. Hûn dikarin bi filman bandora şer li ser mirovan rakin."



"Navenda me ya çandê ji ber êrîşên Daişê wêran bûye. " Şaredara Kobaniyê Hêlîn Hacim dibêje: "Di encamê de hemû çalakiyên çandî wînda bûne." geqaan."

Piştgiriya we ji bo Sînema Kobanî

Weqfa Adar

Weqfa Adarê di avakirina civakeke piştî şer de bi hêza hunerê bawer e. Dema ku fîlmçêker Reber Dosky di sala 2016an de bi Radyoya Kobanî re li IDFAYê xelata baştirîn belgefilma Hollandî wergirt, soza sînemaya xwe da gelê Kobanîyê. Ji bo vê yekê jî weqfa Adar ava kir.

Kobanî

Kobanî, bajarekî Kurdistan ya li Rojavayê, ji şerê bi Daişê re gelek ziyar dîtiye. Jinên YPG'yê dema ku DAIŞ'ê di bin pêşengiya wan de têk çû, li cîhanê navdar bûn. Bajar wêran bû û niştecihan bi enerjîyeke mezin dest bi xebatê kirin da ku ew der ji nû ve ava bikin. Civakeke demokratîk ku tê de hemû etnîkên li Kurdistanê dijîn, hatiye avakirin.

Sînema Kobanî

Reveberiya Kurd li Kobaniyê ji bo cihê Sînemaya Kobanî lê tê çêkirin, li navenda wê erdek bêpere diyarî kir. Mîmar Kees de Wit bi fedakariye sêwiranên yekem ji bo Sînemaya Kobanî çêkir.

Derhêner Reber Dosky

Reber Dosky derhênerê Kurd-Hollandî ye. Fîlmên wî, bi piranî belgefilm in, êş û têkoşîna azadiya kurdan radixe ber çavan. Wî Meyrem, the Sniper of Kobani, Sidik and the Panther, Daughters of the Sun û Radio Kobani, ku Weqfa Adar jê derketiye, çêkiriye. Rêber Dosky rêveberê Weqfa Adarê e.



Mîmar Kees de Wit

Pêşînên yekem ji bo Sînemaya Kobanî ji aliyê mîmar Kees de Wit ya Studio de Wit & Co ve hatine çêkirin. Di sala 2018an de ligel Rêber Doskî serdana Kobanî kirin û planên xwe pêşkêşî xelkê Kobanî kirin. Kees de Wit di seyahetnameya xwe de dinivîse: "Divê ew avahiyek be ku we vedixwîne hevdîtinê". Sînemaya Kobanî dê hêvî, serbilindî û gihîştinê nîşan bide."



Fînansekirina Sînema Kobanî

Beppo Everts, mamosteyê Reber Dosky, ew bi karê wî bi bandor bû. Wê Weqfa Adarê kir hevparê mirasa xwe. Beppo Everts zêdetirî yek mîlyon euro wekî sermayeya destpêkê hişt. Ji bo çêkirina qalikê Sînemaya Kobanî nêzîkê pênc mîlyon euro pêwîst e. Piştî wê, ji bo sêwirandin û karmendan dê pênc mîlyon euroyên din hewce bike. Dê dirav ji bo vê yekê were girtin, lê em texmîn dikin ku dê nîvê perê ji aliyê xêrxwazan were berhevkin.



Pêwîstiya me bi piştgiriya civaka Kurd heye. Ji ber vê yekê ji we!

Weqfa Adar

Weqfa Adarê li Holendayê ye û desteya wê ya serbixwe heye ku çavdêriya xebatên weqfê û xerckirina hatinên Sînemaya Kobanî dike. Weqfa Adarê xwedan nîşana kalîteyê ya ANBI ye. Ji ber vê bac têne daxistin.

info@stichtingadar.nl

www.stichtingadar.nl (Wergerên Kurmancî û Îngilîzî bèn)

IBAN: NL70 INGB 0008 11 24 22

BIC: INGBNL2A | RSIN: 857922920 | KvK: 69570523